
Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :855 14-Nîsan- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165



# Qutbûna parçeyê mezin ji qeşaya li Antarktîka, dibe ku avê çend metreyan bilind bike



Qutbûna parçeyek ji qeşa li rojavayê Antarktîka, dibe ku asta avê ya li okyanûsê 3 metreyan bilind bike.

Bandora germayiya global herî zêde li ser qeşayê eşkere dibe. Qeşa li cemseran ji ber germayiya global rojbiroj pirtir dihele. Zanyaran herî dawî bal kişand ser metirsiya ji ber helîna qeşa li rojavayê parzemîna Antarktîka. Daxuyaniya têkildarî lêkolînên dawî yên pisporên Brîtanyayî balê dikişîne ser metirsiya qutbûna 'Pine Island Galcier (Qeşa Girava Pine). Di lêkolînê de ku pisporên Zanîngeha Northumbriayê tevlî bûne, ji ber germbûna li herêmên nêzî cemseran, okyanûs dibe ku nikaribe pêşî li qutbûna qeşayên mezin yên li van herêman bigire. Hişyarî hat dayin ku eger helîna qeşayê bi qasî dudu ji sê parên xaka Qraliyeta Yekbûyî neyê astengkirin, ava li okyanûsê wê di asteke mezin de bilind bibe. Li gorî vê yekê eger germayiya li okyanûsan bi pileya 1.2 zêde bibe, wê helîna Pine Island Glacier nikaribe bê astengkirin.

Di daxuyaniyê de girîngiya Pine Island Glacier û qeşa bi navê Thwaites ya li kêleka wê hat bibîrxistin û hat diyarkirin ku para van her du qeşayan di bilindbûna ava okyanûsan ya li cîhanê de ji sedî 10 e. Li gorî lêkolînê, helîna Pine Island Glacier wê bi serê xwe bibe sedem ku ava li okyanûsê 3 metreyan bilind bibe.

Pisporê bi navê Sebastian Rosier yê cihê xwe di nava lêkolînê de girtiye, diyar kir ku berûvajî lêkolînên heta niha hatîn kirin, di helîna vê qezayê de êdî 'asta krîtîk' e.

*ANF*

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 6 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | ■ | İ | Z | ■ | A | K | A | M |
| 2 | ■ | A | D | A | N | ■ | E | ■ | İ |
| 3 | A | B | ■ | L | ■ | E | W | K | ■ |
| 4 | C | A | N | ■ | E | Y | ■ | Ê | Ş |
| 5 | ■ | D | O | T | M | A | M | ■ | Ê |
| 6 | J | İ | ■ | Û | ■ | R | A | S | T |
| 7 | I | ■ | A | L | A | ■ | R | A | ■ |
| 8 | ■ | X | W | E | ■ | A | S | Y | A |
| 9 | | ■ | A | ■ | L | A | ■ | İ | Ş |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | ■ | | ■ | | | | | |
| 2 | | | | | | ■ | | ■ | |
| 3 | ■ | | ■ | | ■ | | | | |
| 4 | | ■ | | | | ■ | | | ■ |
| 5 | | | ■ | | | | ■ | | |
| 6 | ■ | | | ■ | | ■ | | | |
| 7 | | ■ | | | | | ■ | | |
| 8 | | | | | ■ | | | ■ | |
| 9 | | ■ | | ■ | | | ■ | | |

ÇEP-RAST

1. Xeyal
2. Amadebûna hilanîna lengerê kêştiyê
3. Ava qirêj ya piştî şûştinê
4. Genimê hêrayî... Cînava şexsê 3. ji bo rewşa netewandî
5. Cejin, eyd... Şivika darîn ya zirav ya serî tûj û bi kevan tê avêtin... Eşîr, qebîle, hoz
6. Baneşana kêfxweşiyê... Bi erebî "ez"
7. Firaq... Baneşaneke gazîkirinê
8. Çong... Cihê heranê
9. Rojek... Yezdanekî misrî

JOR-JÊR

1. Kurtiya ajansa fermî ya Tirkiyê... Daçekek ku wateyê xurt dike... Kevok
2. Kurtiya piştî zayînê... Notayek
3. Pirsek di rewşa ne tewandî de... (Ehmedê ...) Nivîskarê pirtûka 'Mem û Zîn'ê
4. Meydana tenîslîstinê... Pirç
5. Tûj... Kurtiya ajansa nûçeyan ya Dîcle
6. Xwarina sereke
7. Lixwekirina piyan
8. Mirêk, neynik
9. Zeviya cotkirî ya neçandî... (… Bedirxan) Balerîneke kurd

## Tûrikê çîvanokan

***Di tûrikê me de îro çîvanoka li ser pitikê heye. Ji bo razanê dayîk pitikê dixe dergûşê û dihejîne heta bi xew ve diçe. Dema pitirk digirî dayîk pêsîra xwe ditewîne ser landikê, dixe devê pitikê heta bêdeng dibe. Di ber re jî çîvanokên wiha jê re dibêje.***

### Pitik



**De raze raze delal de raze**
**Dergûşa delal ji darê az e**
**Te şîr gelek xwar êdî nexwaze**
**Pêsîr ziwa ye çiçik lewaz e**
**De raze raze êdî sibe ye**
**Dayîk westaye li benda te ye**

**De lorî lorî delal de lorî**
**Babo li kar e dayîk bi gorî**
**De xewke delal êdî dereng e**
**Dergûşa delal darê sêreng e**
**De raze delal bû nîvê şevê**
**Dayîk ji ber te lew ranakevê**

## Quncika têgînan

| | |
|---|---|
| Afirandin | Xuliqandin, çêkirin, peydakirin, sazkirin |
| Bertek | Bersiv, cewab, nerazîbûn. Gotinek yan kirinek li dijî gotinek yan kirina kesekî: Kurdan li dijî girtina nivîskarê Kurd bertek nîşan dan. |
| Darizandin | Mehkemekirin. |
| Gengaz | Tişta dibe ku bibe, tişta bûyîna wê ne diyar |
| Nirx | 1.Biha, qîmet, fiyet, heq. 2.Tiştên girîng yên pîroz: Nirxên neteweyî |
| Şîrove | Nêrîn û ramanê li ser mijarekê. Hevserok mijar baş şîrove kir |
| Pejirandin | Qebûlkirin, razîbûn, qayîlbûn: Gelek tişt xwestin lê min tev nepejirandin |
| Pêdivî | Tişta lazim, tişta ku divê hebe yan bê kirin. Pêdiviya me bi erebeyekê heye |
| Pêkan | Mûmkin |
| Pêwîstî | Hêftar, pêdivî, tişta lazim: Pêwîstiya me bi gelek tiştan heye |



## Bîlançoya operasyonên 10 rojên li Kampa Holê

Di operasyonên ewleyiyê yên 10 rojên dawî li Kampa Holê ya rojhilatê Sûriyê de, 158 çeteyên şaneyên DAIŞ`ê yên li kampê hatin girtin. *R-2*

## "DAYÎKA MIN YEK JI PAŞMAYIYÊN XWEDAWENDAN E"



Li warê pêxemperan careke din dîrokê xwe dubare kir. Zarokê ku bi salan dê û bav û her kes li bendê bû ji dayîk bû. Ji bo gelekî bindest dîrokeke pîroz bûyîn û vejîneke nû bû. Lê ya rest ew bû ku ji zêkê dayîkeke berxwedêr zarokek azadîxaz û welatparêz ji dayîk bû. *R-3*

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 855 14-Nîsan- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

## Helbestvan Dilzar koça dawî kir



Helbestvan Ehmed Dilzar di 101 saliya xwe de li mala xwe ya li bajarê Hewlêrê koça dawî kir..*R-7*

# KORONA BELAV DİBE XWE BİPARÊZİN

Hevserokatiya Meclisa Rêveber ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê, bi daxuyaniyekê qedexeya derketina derve ya giştî li seranserê herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê ragihand. Qedexe wê ji roja Sêşemê 13/04/2021'ê heta roja Pêncşemê 22/04/2021'ê dewam bike. *R-2*



## "Divê em ji bo azadiya Rêbertiyê têkoşînê xurt bikin"



Dayîkên şehîdan dan zanîn ku rêber Ocalan ji bo rizgarkirina gelên bindest û jinan kedeke mezin daye û gotin, divê em ji bo azadiya fîzîkî ya rêber Ocalan asta têkoşîna xwe bilind bikin.. *R-5*

## Bunyamîn Şeker: dixwazin bi tecrîd û êrişan civakeke bindest bafirînin



Bi bilinkirina asta tecrîda li ser Rêber Ocelan û dijwarkirna êriş û sûcên li dijî HDPê, Rejima AKP-MHPê dixwaze xebat û destkefiyên siyasî tine bike û desthilatê ji xwe re misoger bike. Hiqûqzan van kiryaran bi 'Faşîzma huqûqnenas' bi nav dikin. *R-4*

## Çîrokên zaroktiya xwe niha ew bixwe dibêjin



Lîstikvanên Teatra Sarya Baran ku di binê banê Hîlala Zêrîn de xebata xwe didomînin, çîrokan di stûdyoyên xwe de amade dikin û digihînin temaşevanan. Herwiha hewl didin çanda çîrokan bidomînin.. *R-7*

# Bîlançoya operasyonên 10 rojên li Kampa Holê

Di operasyonên ewleyiyê yên 10 rojên dawî li Kampa Holê ya rojhilatê Sûriyê de, 158 çeteyên şaneyên DAIŞ`ê yên li kampê hatin girtin.

Li Kampa Holê ji bo bêbandorkirin û paqijkirina DAIŞ`ê û şaneyên wê, di 10 rojên dawî de ji aliyê Hêzên Ewlekariya Hundir û Yekîneyên Antî Teror (YAT) ve 28ê Adarê .operasyonên ewleyiyê hatin lidarxistin 2`yê Nîsanê bi dawî bûn. Di wan operasyonan de, ji bilî beşa malbatên DAIŞ`ê yên biyanî ku bi navê "Muhacîrat" tê nasîn, li 8 beşên kampê xebata lêgerîn û kontrolkirinê pêk hatin. Hêzên beşdarî wan operasyonan bûyîn 125 çete girtin ji wan 20 çeteyên berpirsên şaneyên DAIŞ`ê yên li kampê bûn û hejmarek ji wan jî jin bûn. Herwia gelek alavên leşkerî û radarên eleketronîk ku di amadekirina mayînan de dihatin



bikaranîn, hatin desteserkirin.
Di 5 rojên piştî bidawîbûna qonaxa yekê ya Operasyonê de, Yekîneyên Antî Teror li kampê zêdetirî 51 opersayonên serdegirtin û lêgerînê pêk anîn. Di van operasyonan de jî 7 jê jin 33 çeteyên şaneyên DAIŞ`ê hatine girtin.
Li Kampa Holê 60 hezar û 351 kes dimînin û li ser 16 hezar û 404 malbatên ji Sûriyê, Iraqê û welatên biyanî, belav dibin.
*ANHA*

# Li seranserê herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê qedexeya 10 rojan hat ragihandin

Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê qedexeya derketina derve ya giştî li seranserê herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê ragihand. Qedexe 10 roj in û wê roja Şemiyê dest pê bike.
Hevserokatiya Meclisa Rêveber ya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê bi daxuyaniyekê qedexeya derketina derve ya giştî li seranserê herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê ragihand.
Daxuyanî wiha ye:
"Ji ber xetera vîrûsa Korona (Covid-19) û ji bo rêgirtina li pêşiya wê û parastina berjewendiyên giştî, Meclisa Rêveber ya bakur û rojhilatê Sûriyê ev biryar dane:
1-Li seranserê herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê qedexeya derketina derve ya giştî heta 10 rojan wê dewam bike. Qedexe roja Sêşemê 13/04/2021'an dest pê dike û heta roja Pêncşemê 22/04/2021'an dewam dike.
2-Tevayiya deriyên sînor ji bilî rewşên mirovî, nexweş, xwendekar û tevgera bazirganiyê girtî dimînin.
3-Qedexe ne ji bo dikanên firotina madeyên xwarinê û sebzeyan e, lê divê ji saet 8'ê Sibehan heta 5'ê êvarê vekirî bin.
4-Di dema qedexeyê de tevgera çûnhatinê ya cotkar û karkeran ya ji bo karê xwe tê hêsankirin bi şertê ku tedbîrên xweparastinê yên tenduristiyê û dûrketina civakî pêk bînin.
5-(Tevahî nexweşxane, dermanxane, rêxistinên mirovî, ragihandin, firûn, stasyonên firotina sotemeniyê) ne di nav qedexeyê de ne. Xwaringeh dikarin tenê daxwaziyên derve bi cih bînin.
6-Di dirêjahiya dema qedexeyê de, ji bilî daîreyên ku pêwîstiyên ku bi domandina kar heye, xebatên tevahî sazî û daîreyên girêdayî Rêveberiya Xweser tên sekinandin.
7-Divê tevahî welatî rêgezên xweparastina tenduristiyê û dûrketina ji hev pêk bînin û maskan bi kar bînin.
8-Ev biryar her kesî eleqedar dikin."*ANHA*

# Çeteyên El-Hemzat 4 sivîlên ji gundê Basûtê yê Şêrawa revandin

Çavkaniyeke ji navçeya Şêrawa ya Efrînê ragihand ku çeteyên navê "Erkên Taybet" li xwe dikin yên girêdayî Furqeya El-Hemzat, cara duduyan 4 sîvîlên gundê Basûtê yê navçeya Şêrawa revandin.
Li gorî çavkaniyê, çeteyan bi serkêşiya serçete Ebdu Osman, sîvîlên bi navê Betal Fethî (42), Hisên Omer Elûş (22), Şêro Mihemed Xelîl (23) û Xelîl Mihemed Elî (21) bi hincetên bêbingeh revandin.
Li gorî heman çavkaniyê, kesên hatîn revandin, birine zindana çeteyan ya li gundê Ebdelo yê navçeya Şêrawa ya Efrînê. Hêjayî gotinê ye ku heman kes berê jî ji aliyê wê koma çeteyan ve



hatibûn revandin.
Çavkaniyê herwiha da zanîn ku çeteyên Koma El-Hemzat ya girêdayî artêşa tirkî ya dagîrker li gundê Basûtê ji 8`ê Nîsanê ve hemleyeke revandinê ya berfireh dane destpêkirin.
Li kantona Efrînê ya dagîrkirî bi awayekî domdar bûyerên kuştin, revandin û xwestina fidyeyê, herwiha dizî, talan, şewitandina darên zeytûnan û roxandina cihên dîrokî, li gel bêdengiya civakan navneteweyî pêk tên.*ANHA*

# Li Şêrawa ji ber mayîna çeteyan 2 zarokan jiyana xwe ji dest da, 2 jî birîndar bûn

Li derdora gundê Mezin yê navçeya Şêrawa ya kantona Efrînê ya dagîrkirî ji ber teqîna mayînên çeteyên dewleta tirkî ya dagîrker du zarokan jiyana xwe ji dest da, 2 jî birîndar bûn.
Li gundê Mezin yê navçeya Şêrawa ya kantona Efrînê mayîneke ku çeteyên dewleta tirkî ya dagîrker çandibûn, bi 4 zarokan de teqiya. Her 4 zarok kurmamên hev in. Di encamê de du zarokan jiyana xwe ji dest da û 2 jî bi giranî birîndar bûn.
Zarok ji bo nexweşxaneya Avrîn ya navçeya Fafînê ya Şehba hatin veguhêstin.
Li gorî agahiyên ku rêveberiya



nexweşxaneyê dane ANHA'yê, navên zarokên ku jiyana xwe ji dest da Azad Îbrahîm Hisên (12), Dilyar Hemo Hisên (11). Zarokên birîndar; Hisên Îbrahîm Hisên (10) Nesrîn Mihemed Hisên (16).
*ANHA*

# HPG'ê li dijî qereqoleke artêşa tirkî çalakiyeke hewayî kir



HPG'ê diyar kir ku Hêzên Parastina Hewayî ya Şehîd Delal ji hewa ve li qereqola Girê ya navçeya Çelê ya Colemêrgê daye.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyên gerîlayan û êrişên artêşa tirkî ya dagîrker daxuyaniyeke nivîskî da. HPG'ê di daxuyaniyê ev agahî dan:
"Hêzên Parastina Hewayî ya Şehîd Delal di çarçoveya pêngava 'Dem dema azadiyê ye' de di 8'ê Nîsanê de danê êvarê bi wesaitên hewayî li qereqola Girê ya li Çelêya Colemêrgê dane. Bi wesaitên hewayî li dagîrkerên li vê derê û li hedefan hat xistin.
Dewleta tirkî ya dagîrker li hemberî Herêmên Parastinê yên Medyayê êrişên hewayî kirine.
Di 8'ê Nîsanê de saet di 14.00'an de derdora gundê Bêbadê ya herêma Garê hatiye bombekirin. Di vê bombebaranê de xisar gihiştiye bax û baxçeyên gundiyan.
Di 8'ê Nîsanê de saet di 15.15'an de qada Karker a Zapê hatiye bomberdûmankirin.
Di 9'ê Nîsanê de qada Tepê Ortê ya Metîna hatiye bombekirin.
Di van bombebaranan de tiştek bi hêzên me nehatiye."

# QSD: Idîaya Wezareta Parastinê ya dewleta tirkî ne rast e



Office of Media&Information
@SDFinformation

Roja 10ê Nîsanê, li ser hesabê Twitter a Wezareta Berevaniya Tirkiyê nûçeyek hat belavkirin ku 3 şervanên me hatine şehîdxistin. Ev nûçe ne rast e.

Berevajî vê, duh bajaroka Eyn Îsa û derdorên wê ji alî artêşa Tirk ve bi dijwarî hatiye topbarankirin.

QSD'ê diyar kir ku idîaya Wezareta Parastinê ya dewleta tirkî ya têkildarî şehîdbûna 3 şervanên QSD'ê derew e.
Navenda Ragihandinê ya QSD'ê, li ser hesabê xwe yê Twitterê têkildarî idîaya Wezareta Parastinê ya dewleta tirkî ya dagîrker agahî dan û diyar kir ku idîaya dewleta tirkî ya ku 3 şervanên QSD'ê hatine şehîdkirin, ne rast e.
QSD'ê ev agahî da: "Roja 10'ê Nîsanê, li ser hesabê Twitterê yê Wezareta Parastinê ya Tirkiyê nûçeyek hat belavkirin ku 3 şervanên me hatine şehîdxistin. Ev nûçe ne rast e."



# Helbestvan Dilzar koça dawî kir

Helbestvan Ehmed Dilzar di 101 saliya xwe de li mala xwe ya li bajarê Hewlêrê koça dawî kir.

Kurê helbestvan Ehmed Dilzar, Aram Dilzar li ser hesabê xwe yê Facebookê da zanîn ku roja Şemiyê saet di 13.30'an de Ehmed Dilzar koça dawî kiriye.
Navê rast yê Ehmed Dilzar, Ehmed Mistefa Mihemed e. Ehmed Dilzar di 8'ê Çileya sala 1920'an de li navçeya Koyê ji dayîk bûye. Dilzar di sala 1959'an de dibe endamê Yekîtiya Wêjevanên Ereb. Di sala 1970'an de, wek yekem endamê Desteya Rêveberiya



Yekîtiya Nivîskaren Kurd tê hilbijartin.
Ji sala 1974'an heta 1979'an nûnerê Lijneya Eniya Demokratîk ya Hewlêrê bû. Herwiha endamê Encûmena Yasanan ya Herêma Kurdistanê bû. Di sala 1975'an de endamtiya Encûmena Alîkariyê ya Iraqê ya aştiyê girt. Pişt re koçî Swêdê kir û li wir bi cih bû.
Cenezayê Dilzar wê li Koyê were veşartin.
ANHA



## KNK`ê ji bo wefata Ehmed Dilzar peyama sersaxiyê da

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) peyama sersaxiyê ji malbata helbestvan û nivîskarê Kurd Ehmed Dilzar re şand.
Komîteya Ziman, Çand û Perwerdeyê ya KNK`ê peyama sersaxiyê ji bo wefata nivîskar û helbestvanê Kurd Ehmed Dilzar da
Di peyama sersaxiyê de wiha hat gotin:
"10'ê Nîsana 2021'an nivîskar, helbestvan û têkoşerê mezin yê gelê me di temenê xwe yê 101 salî de koça dawiyê kir. Li gel hevxemiya me ji bo malbata wî, di heman dem da sersaxiyê li gelê Kurd û Kurdistanê radigehînin.
Ehmed Dilzarê niştimanperwer û mirovdost, hevtemen û hevrêyê Dildarê afirînerê sirûda 'Ey Reqîb' û nifşê zêrîn ê afirandin û edebiyata nîvê yekemîn ê sedsala 20'an bû. Xerman û pêdera nivîsînên vî helbestvan û nivîskarê mezin, gencîneyekê sengîn û pir nirx û tije serwerî ye. Berhemên wî valatiyeke berçav ji ferheng, ziman û wêjeya kurdî tije kirine. Di heman dem de jî Dilzar Kurdpewer û şoreşgêrekî îradebilind her tim bi hêvî bû di bizava rizgarîxwaza Kurdistanê de. Heta rojgarên xwe yên dawiya jiyana xwe jî ûmêd û hêviya azadî û rizgariya Kurd û Kurdistanê li nik wî mijara sereke bû.
Em Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê dubare sersaxî û hevxemiyên xwe ji bo gelê Kurd û. Kurdistanê û malbata wî radigihîn in û bi hêviya giyanekê şad û bextewer dixwazin."

# Çîrokên zaroktiya xwe niha ew bixwe dibêjin



Lîstikvanên Teatra Sarya Baran ku di binê banê Hîlala Zêrîn de xebata xwe didomînin, çîrokan di stûdyoyên xwe de amade dikin û digihînin temaşevanan. Herwiha hewl didin çanda çîrokan bidomînin.
Teatra Sarya Baran ku koma şanoyê ya yekê ya jinan li Rojava ye, sala 2018'an dest bi xebata xwe kir. Teatra Sarya Baran di binê banê Hîlala Zêrîn de xebata xwe didomîne. Niha jî bi Jin TV re projeyeke hevpar çêkiriye û dest bi bernameya "Hebû Tinebû" kiriye. Teatra Sarya Baran sala 2018'an dest bi xebata xwe kir û heta niha gelek lîstik çêkirine. Teatra Sarya Baran di Adara 2020'an de ji ber vîrûsa koronayê hatibû girtin lê projeyeke çîrokan çêkir, da xwendekarên wê di perwerdeyê de li paş nemînin. Pişt re ev proje bi Jin TV re derxist ser ekranan.
Şevîn Xelîl û Barae Hesen xebata xwe û projeya Hebû Tinebû nirxand.
Şevîn Xelîl di 13 saliya xwe de li Navenda Çand û Hunerê ya Hîlala Zêrîn tev li xebatê bûye û di sala 2018'an de bi avabûna Teatra Sarya Baran re di gelek lîstikan de dest bi lîstikvaniyê kiriye.
Şevîn Xelîl diyar kir ku bi belavbûna koronayê re xebata wan rawestiyane û wiha got: "Piştî belavbûna vîrûsa koronayê li herêmê, me karê xwe yê li ser înternetê domand. Me çîrokên xwe tomar kirin da ku xwendekar ji lêkolînan li paş nemînin. Pişt re me bi Jin TV re hevkarî kir û dest bi kêşandinê kir."
Şevîn Xelîl axaftina xwe wiha domand: "Em vê xebatê di warê parastina zimanê dayîkê û parastina çand û kevneşopên gel de girîng dibînin. Em dizanin ku çîrok û çîvanok dîroka gelan vedibêjin. Gelek êrişên bi armanca tinekirina çanda me hene û em dixwazin bersivê bidin wan. Em armanc dikin ku vê çandê biparêzin û bi xebata xwe ya Hebû Tinebû pirtir xwe bigihînin temaşevanan."
Lîstikvana Teatra Sarya Baran Şevîn Xelîl got, projeya Hebû Tinebû wê salekê dirêj bike û ev agahî dan: "Çîrokên ku em vedibêjin, çîrokên naskirî ne. Em van çîrokên ku em ji dayîk û dapîrên xwe hîn dibin, pêşkêşî temaşevanan dikin."
Şevîn Xelîl axaftina xwe wiha domand: "Dema ez zarok bûm, bi çîrokên diya xwe, mezin bûm. Lê di vê demê de dîtina wê ne hêsan e û bi pêşketina teknolojiyê re gel ji çanda xwe dûr dikeve. Dayîk û dapîra min çîrokên ku ez û hevalên xwe niha vedibêjin, ji me re vedigotin. Cudahiya di navbera şêwaza wan û niha de, vegotin e û şêwaza ku niha em dibêjin pir zelal e."
Şevîn di dawiyê de bang li ciwanan kir ku li çand û dîroka xwe xwedî derkevin.
Lîstikvana Teatra Sarya Baran Barae Hesen jî li ser karê xwe ev agahî dan: "3 sal in ez li Teatra Sarya Baran im. Projeya Hebû Tinebû armanc dike ku çand û zimanê kurdî mayînde bike. Wek hunermend divê em bibin bersiva êrişên asîmîlasyonê yên ji bo tinekirina çand û zimanê kurdî. Em vê yekê bi projeyên xwe dikin."
Berae Hesen diyar kir ku gelek çîrokên hatine vegotin rûdanên demên berê ne û wiha got: "Hûrî, Med û şaristaniyên din yên Kurdan, hemû bi çîrokên xwe heta roja îro hatine. Çîrokên ku em hewl didin vebêjin, bi rastî jî ji wê serdemê ne. Dê û bavên me van çîrokên li ser dîrok û serpêhatiyên gelê Kurd ji me re vegotin. Bê wan çîrokan wê dîroka gelê Kurd tine bibûya."
Barae Hesen got, em deqan li rûyên xwe çêdikin. Em cilên herêmî li xwe dikin. Em madeyên ku berê dihatin bikaranîn, find, çirayên gazê bi kar tînin. Û di vê yekê de, em bi rastî hewl didin tiştên ku berê qewimîne, ji raya giştî re vebêjin. Em armanc dikin ku çanda xwe ku di navbera serdema nûjen de bi nemanê re rûbirû mane, bi dîtbariyê zindî bimînin û di hişê gel de zindî bimînin."
Barae Hesen da zanîn ku her çîrokek xwedî hesteke cuda ye û wiha dewam kir: "Her çîrok bi rastî jî bi xwe roleke perwerdekar dilîze. Bi çîrokê re aso û perspektîfên zarokên mezin dibin, bêhtir zindî û dînamîk dibin."
Di dawiyê de Berae Hesen bang li ciwan û mezinan kir ku bi xwedîlêkirina li çanda xwe çîrokan zindî bihêlin.
"Hebû Tinebû" her êvara Sêşemê saet 18:45'an li ser ekranên Jin TV tê nîşandan.
*ANHA*

# Mezopotamya Arşîv bîra civakê zindî dike

Bi pêşketina cîhana dijîtal êdî jiyan li ser platformên medyaya civakî didome, ji xwarin, vexwarin, gerin, lêgerin, siyaset, aborî, niqaş, perwerde û hwd bi kurtasî jiyan tev êdî li ser platformên dijîtal tê jiyîn.
Bîr û baweriya hemû civakên li ser rûyê cîhanê êdî di medyaya civakî de ye. Ev yek jî rê li ber lêkolîn û rê û rêbazên ku mirov çanda gelan, ziman, bîr û baweriya gelan çawa zîndî bihêle, vedike. Malpera Mezopotamya Arşîv (Mezopotamiya Archive) jî li ser vê bîr û baweriyê wek malpereke dijîtal a arşîvê tê avakirin.
Malpera Mezopotamya Arşîvê bi armanca daneheva dîmen, wêne û videoyên bi salane ku ji aliyê gel hatine kêşan ve wan dide hev. Ev malpera ku li ser platformên dijîtal dest bi weşana xwe kirî dîmen û wêneyên ku li ser erdnigariya Mezopotamyayê hatî kêşan tên parvekirin.
Bi kurdî û ingilîzî
Malpera ku bi kurdî û ingilîzî parvekirinên xwe dike têkildarî mijarê xebatkarên Mezoptamya Arşîv wiha dibêje: "Her miletek bi rabirdûya xwe heye. Em wek Mesopotamia Archive li dû wê rabirdûyê ne ku her dem hatiye veşartin û jibîrkirin. Em bi gotina 'Tiştê tê jibîrkirin, tê dubarekirin' esas digirin û armanca me ew e ku êdî arşîva Mezopotamyayê ya bi rêk û pêk hatiye tomarkirin hebe. Em dê li ser malpera xwe û hesabên medyaya civakî yên wekî YouTube, Twitter, Facebook, Instagram û Pinterestê dîmen û wêneyên ji arşîva kûr a Mezopotamyayê parve bikin. "
Her kes dikare dîmen û wêneyan bişîne
Malper ji bo daneheva berhem, dîmen û wêneyên di destê gel de heyî bangê dike û vê tiştê dibêje: "Em ji raya giştî dixwazin ku dîmen û wêneyên ku wek arşîv li cem xwe tomar kirine bi me ra parve bikin. Mesopotamia Archive dê dîmen û wêneyan bi awayekî profesyonel biparêze û bi rêk û pêk li ser navê wan kesên şandî parve bike."
*Xwebûn*



# Biryara Rêveberiyê ji bo xaniyên kirê ji gel re bû alîkar

Welatiyên bajarê Qamişlo di peydekirina xaniyên kirê de zehmetiyê dikişînin. Ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê Rêveberiya Xweser li gorî her xanî, biryara bihayê wî derxist. Endamê Yekîtiya ofîsa eqarî Ehmed Xelef got, çi kesê vê biryarê paşguh bike, wê were cezakirin.

**Dilîn EHMED/Qamişlo**



Sedema sereke ya bihabûna nirxên xaniyên kirê, daketina lîreyê Sûrî ye. Ji ber bihabûnê, şêniyên bajarê Qamişlo û koçberên ji derve hatîn, di peydekirina xaniyan de zehmetiyê dikşînin. Lewre li gelek taxan xanî bi dolaran tên dayîn. 22ê Sbatê ji aliyê Mecilsa Karûbar ya Herêma Cizîrê bîryara nirxên xanîyên kirê derxist. Ev rêbaze heya astekê ji bo kesên bê xanî bu alîkar.

**"YÊ KU BIRYARÊ PAŞGUH BIKE DIVÊ WERE CEZAKIRIN"**

Ji bo em zanyariyên zêdetir bigrin dest û hilbijartina xelkê ji vê biryarê nas bikin, me nerînê şêneyê Qamişlo girt. Welatiyê ji taxa Xerbî ya bajarê Qamişlo Mihemed Hesen da xuyakirin ku sedema buhabûna nirxê xaniyan rewşa aborî ya ku welatî niha tê de dijîn û got; "Ji ber ku niha her tişt bihabûye û lîreyên Sûrî li hemberî dolarên Emerîkî daketiye, biryara Rêveberiya Xweser gelekî baş e û divê xelkê me vê biryarê binpê neke. Bi taybetî ji ber ku jimerek mezin ji milatê me yê ku ji êrişên dewleta tirkî ya dagîrker koçber bûne, wê nikaribin xaniyan bi nirxên biha kirê bikin."

Mihemed Hesen diyar kir ku divê xwediyên xaniyan bi wijdanî xaniyên xwe bidin kirê û got: "Xaniyekî min li taxa Kornîş heye min daye malbatekê ji Efrînê bi 100 hezarê Sûrî. Li wê taxê piraniya xwediyê xaniyan bi dolar didin xelkê, lê ez dibêjim divê miletê me bi wijdanî vî karî bikin. Lewra bi yên ku xaniyên wan tine ye, neçarin xaniyan kirê bikin, lê ne bi nirxekî buha. Herwiha didawiyê de dibêjim, bi hêvîme yê ku vê biryarê bi cî neyne Yekîtiya Ofîsên Eqarî wan ceza bikin."

Welatiyê bi navê Hesen Omerî ku yek ji koçberê bajarê Serê Kaniyê ye, behsa zehmetiyên



peydekirina xaniyên kir û anî ziman ku sedema bihabûna pêdiviyên jiyanê, dihêle nirxê kiriya xaniyan jî biha bibe û wiha axaftina xwe dewam kir: " Yên weke me ku ji ber tang û topan dijmin ji malên xwe derketîn û neçarin di kirê de bijîn, nirxê ku xwediyê xaniyan ji me bixwazin, divê bi çi rengî be jî em peyda bikin. Ji ber wê divê cihê berpirsyar, kesên vê biryarê paşguh bike wan ceza bikin."

**BINPÊKIRIN BI CEZAYÊN PEREYAN IN**

Li ser vê mijarê Endamê Yekîtiya ofîsa eqarî ya Qamişlo Ehmed Xelef jî diyar kir ku li ser nirxê firotin û kiriya xaniyan bi dolar, pirsgirêk derdikevin û wiha got; "Di biryara ku berî demakê derketî, xaniyê herî biha divê ne zêdetirî 150 lîreyê Sûrî be. Kesê ku di riya ofîsên me re xaniyan kirê bikin, ti kes nikare wî ji xanî derxe û ne jî



pirsgirêka jê re derxîne. Ji bilî wê em nikarin alîkariya ti kesî bikin. Lewra yê ku xaniyan kirê dikin divê peymana xwe li cem me çêke."

# Li Tebqa 2 stasyonên avê ji nû ve hatin xebitandin



Saziya Avê ya Tebqa piştî 2 stasyonên ava vexwarinê xistin xizmetê. Lewre dewleta tirkî ava çemê Firatê kêm kiriye û rêjeya wê daketiye. Ji ber wê stasyon ji xizmetê derketibûn.

Dewleta tirkî ya dagîrker ava çemê Firatê ji zêdetirî 2 mehan ve kêm kiriye.

Stasyona Ayikd û El-Cerafat yên Tebqa ji ber kêmkirina ava çemê Firatê, ji xizmetê derketin.

Saziya Avê ya girêdayî Meclisa Sîvîl ya Tebqa hefteya borî dest bi xebitandina her du stasyonan kir.

Têkildarî mijarê hevserokê Saziya Avê ya Tebqa Hemûd El-Şêx wiha got: "Me hin guhertin di stasyonê de çêkirin û ji nû ve saz kirin."

Hemûd El-Şêx diyar kir ku şêniyên taxa Ayid, ji sedî 30 sûd ji guhertinê negirtin û av bi sahrîcan ji wan re tê şandin.

Herwiha çavdêrê Saziya Avê Hazim Aşûr wiha axivî: "2 bîr di stasyona Ayid de hene. Me bi torbîneke din stasyon sererast kir da ku ji nû ve bixebite."

Her du stasyon ji ber kêmbûna ava gola Bendava Firatê bi qasî 15 metreyan, ji xizmetê derketibûn.*ANHA*

# "Bi pîroziya Çarşema Sor emê bi ser bikevin"

**Hediya HISÊN/Qamişlo**



Plan û gefên dagîrkirina Şingalê rojana zêde dibin. Êzîdiyên bakur û rojhilatê Sûrî nerazîbûna xwe nîşan didin û dibêjin "Şingal ya Êzîdiyan e, emê xaka xwe biparêzin û serî ji dijmin re danaynin."

**LI ŞINGALÊ CIVAKA ÊZÎDÎ BERXWEDANEKE DÎROKÎ DINIVISÎNE**

Debarê mijarê de Hevseroka Yekîtiya Êzîdiyan li Efrînê Sûad Hiso axivî û ev nirxandin kir; "Peymana 9ê Cotmeha 2020an ya di navbera hikumeta Iraq û Hewlêrê de hatî imzekirin ne peyman e, derheqê gelê Şingalê de ragihandina fermaneke nû ye. Ev 7 Sal in gelê Şingalê xwe bi derfeên xwe diparêze, mafê ti kesî nîne derbasî erdê Şingalê bibe.

Sûad diyar kir ku destê dewleta tirkî jî di vê peymanê de heye. Li gorî berjewendiyên xwe hikumetaa Iraqê û ya Hewlêrê dixe tevgerê. Çawa bi riyeke derveyî exlaq û mirovayiyê Efrîn û Serê Kaniyê dagîr kir dixwaze wisa li Şingalê jî bike.

Sûad da zanîn ku ji bilî YBŞ û YJŞe ti kes nikare gelê Şingalê biparêze û axaftina xwe wiha domand: "Helwesta me Êzîdiyan ew e ku Êzîdî li kîjan derê bin wê li ber xwe bidin. Li ser vê xaka pîroz jina Êzîdî hêzeke xwe afirand. Herwiha banga me ji Êzîdiyên cîhanê hemûyan re heye ku li Şingalê xwedî derkevin.

Sûad Hiso cejna Çarşema Sor li rêber Apo û tevayiya gelê Kurd pîroz kir û got, wê cejina Çarşema Sor bi coşeke mezin li Şingalê bê pîrozkirin. Bi pîroziya cejina Çarşema Sor emê bi ser bikevin

**EM ŞINGALÊ RADESTÎ DIJMINAN NAKIN**

Hevserokê Mala Êzîdiyan li herêma Cizîrê Farûq Tozo jî diyar kir ku ji destpêkê ve civaka Êzîdî li Şingalê helwesta xwe da xuyakirin ku wê li çiyayên xwe xwedî derkevin. Fermana 2014an bertekên gelê Şingalê li dijî dijmin bihêztir kir. Rewşa Şingalê ya dawî li ber çavan e. Du hefte di ser mohletê re derbas dibin û bêdengiyek derketiye pêş. Ev diyar dike ku dewleta Iraqê helwesta gelê Şingalê cidî digire û eger êriş bike wê zextên navneteweyî lê bên kirin.

Farûq bal kişand ser sedemên peymanê yên di vê demê de û got, ti carî hikumeta Iraqê bawer



nedikir ku civaka Êzîdî bibe xwediya hêzeke leşkerî û rêveberiyeke xweser. Ji ber wê bi vê peymanê xwest baweriya Êzîdiyan ya bi vê hêzê bişke û bi taybetî gefê li Rêveberiya Xweser bixwe da ku di navbera Rêveberiya Xweser û civaka Êzîdî de bêbaweriyê çêke. Lê berxwedan û helwesteke bihêz li hemberî wan hat nîşandan.

Farûq axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Bi çi awayî dibe bila bibe em çiyayê Şingalê radestî dagîrkeran nakin. Heta Êzîdiyek li ser vî erdî sax be wê li Şingalê berxwedan hebe."



## Navendên Daxwazên Edaletê

**Farûk SAKIK**

Di dema Împaratorê Romayê Tîberîus de, cînayet û êşkence derdikeve asta herî bilind. Li ser vê rewşê hevalê Împarator Nerva, êdî naxwaze ku bibe şahidê vê rewşê. Ji bo pêkanîna edaletê, li ber deriyê qesrê dest bi rojiya mirinê dike.

Helbestvanê Îrlandî, William Butler Yeats li ser mirina wî nivîsekê dinivîse û weha dibêje: ...Eger li mirovekî neheqî hatibe kirin an jî texmîn bike ku neheqî lê hatiye kirin û li ber deriyê xelkê ji birçîna bimire, eger ew derî deriyê Qiralan be jî, wê qêrîna wî heta hetayî di guhê gel de, bimîne.

Li cîhanê li gelek deveran lêgerînên edaletê hene. Li van navendan, ji kesên ku edalet binpêkirine, edalet tê xwestin.

Siyaseta dewletan dibû sedema mexdûriyeta mirovan. 'Edalet' di dest wan de bû. Gelek caran dewletên ku edalet di dest wan de bû, wan bixwe ev edalet binpê dikirin. Piştî ku rêveberî diket dest wan, wan jî peyva 'Edaletê' wek çek li dijî gelê xwe bikartanî.

Ev edalet ji bo kê ye? Çima hawar û qêrîna edaletyê ya kesên ku zarokên wan têne revandin, windakirin û kuştin, nayê bihîstin? Çima hawara dayikên ku zarokên wan hatin revandin û li qereqolên leşker û polîsan hatin kuştin, nayê bihîstin?

Tenê bersivek heye, ew jî bêedaletya kesên ku 'edalet' xistine destê xwe de ye.

Dema ku li Tirkiyê, edalet hat binpêkirin, li dijî van desthilatdaran hin 'navendên lêgerîna li edaletê' avabûn.

Mînak; Li ber deriyê Lîseya Galatasaray, Parka Koşuyolu û Kolana Gulîstan; Her hefte çalakiya 'Dayikên Şemiyê' pêktê.

Ber Gara Enqerê; 101 malbatên kesên ku zarok û merivên wan ên banga aştî û demokrasiyê li Enqerê kirin û li GAR'a Enqerê hatin kuştin, her meh ji bo pêkanîna edaletê li ber deriyê Gara Enqerê, daxuyaniyê didin.

Li ber Edliyeya Rihayê; Emîne Şenyaşar û kurê xwe Ferit Şenyaşar bi daxwaza "edaletê" çalakiya rûniştinê pêk tînin.

Li Şengalê jî di bin "Konê Rûmetê" de; Li dijî peymana 9'ê Cotmehê û ji bo naskirina statuya Şengalê, berxwedanek e bê navber dewam dike. Şengalî daxwaza pêkanîna edaletê li Neteweyên Yekbûyî û hikumeta Iraqê, dikin.

Girtîgeh; Ji bo azadiya fizîkî ya Rêber Apo, girtiyên azadiyê li dehan zîndanên dewleta Tirk di greva birçîbûnê de ne. Çalakiya girtiyan a bêdem û bidorvegerî di 27ê Mijdara 2020'an de destpêkir. Grev her 5 rojan dewrî komên nû, dibe.

Çalakiya girtiyên azadiyê jî weke çalakiya Nerva ya li ber deriyê qralê Romayê ye.

Faşîzma AKP'ê her çiqasî di tecrîdê de bi israr e, berxwedana girtiyên azadiyê jî ji bo azadiya Ocalan, bi biryardarî dewam dike.

Dibe ku bêgotin encamwergritina ji çalakiya zindanan, zehmet e. Na.... Nedsetpêkirina vê çalakiyê wê bihata wateya erêkirina dîlgirtin û tecrîda rêber Apo.

Nerva jî Qral Tîberîus baş nasdikir. Lê ji bo balê bikişîne ser bêedaletya wî, mirin da ber çavên xwe.

Çalakvanên li girtîgehan jî vê yekê baş dizanin. Dibe ku Faşîzm, demek e dirêj beramberî çalakiya wan, bêdengiya xwe dewam bike. Lê heger ji derve ev nobeda azadiyê dewr were girtin û pêngava 'dem dema azadiyê ye' were xurtkirin wê encam were girtin. Girtiyên Azadiyê vê yekê ji berxwedan û encamwergirtina çalakiya M. Hayrî durmuş û Kemal Pîr, dizanin.

Îro li derve xemsariya sala 1982'an dûbare dibe, metirsî jî ev e. Îro ji her demê bêtir derfeta piştgiriya çalakgerên zîndanan heye. Pêwist e li derve mirovahî cilika xemsariyê ji ser xwe bavêje.



# Koordînasyona Kongreya Star dayîka Uweyş bîr anî

Koordînasyona Kongreya Star dayîka rêber Abdullah Ocalan di salvegera wefata wê de bîr anî.

Roja 11ê Nîsanê salvegera 28'an ya salvegera wefata dayîka rêber Abdullah Ocalan bû. Bi wê pêmanê Koordînasyona Kongreya Star daxuyaniyeke nivîskî weşand.

Kongreya Star di daxuyaniya xwe de wiha got:

"Dayîka Uweyş mînaka jina bihêz e ku serî ji zilmê re dananî. Zarokên xwe li ser vî esasî xwedî kirin. Ji me re mînaka serbilindiyê ye. Lewre riya ber bi azadiyê ve ji me re ronî kir. Ew bû ku rêberê mezin anî dinyayê, xwedî kir, mezin kir ku bi saya wî em bi azadî dijîn.

Rêber Abdullah Ocalan dayîka xwe weke xwedawendekê pênase kiriye. Em serfiraziya xwe tînin ziman ku kesayetek ku têkoşîna rizgariya Kurdistan û cîhanê bi rê ve dibe, anî dinyayê.

Rêber Abdullah Ocalan ji hêza dayîka xwe sûd girt û ji xwe re kir çavkaniya hêza şoreşa jinan ku ji bo wê tê dikoşe.

Dayîk mamoste, perwerdekar û




rewşenbîr e. Ji ber wê dema rêber Abdullah Ocalan behsa jiyana xwe dike kesayeta dayîka xwe bîr tîne û di kesayeta dayîka xwe de kesayeta jina bihêz û rêveber şîrove dike. Em Koordînasyona Kongreya Star dayîka Uweyş û tevayiya dayîkên aştiyê bîr tînin û rehmet li giyanê wan be. Wan rêberên ku bi saya wan jin û gelên herêmê hatin rizgarkirin, anîn dinyayê."

*ANHA*

# Dayîka Rojê Uweyşa serhildêr

**Darîn Silê/Qamişlo**



Di salvegera 28an ya wefata dayîka Uweyş de, berdevka Kongreya Star Remziya Mihemed, dayîka Uweyş û dayîkên aştiyê bîr anîn û diyar kir ku dayîka Uweyş dayşka tevayiya gelan e. Çimkî kesayetek weke Rêber Abdullah Ocalan anî dinyayê.

**"JINAN DI KESAYETA DAYÎKA UWEYŞ DE HÊZ Û BAWERIYA XWE MEZIN KIRIN"**

Remziya Mihemed anî ziman ku Dayika Ûweyş bi xwedîkirina Rêber Abdullah Ocalan îsbat kir ku azadî ji zarokatiyê dest pê dike û wiha berdewam kir; "dema Rêber Apo behsa hêza xwe dike despêkê dayika xwe bîr tîne, ji ber ku hêz û vîna xwe tev ji dayika xwe girtiye. Tevî zehmetî û xizantiya ku dayika Uweyş têde jiyan dikir, lê zarokên xwe bi awayekî rast û moralekî xurt mezin kir."

Berdevka Kongreya Star Remziya Mihemed da zanîn ku gelek dayikên mîna yadê Uweyş hene û wiha bi dawî kir; "Bi hezaran dayikên kurd zarokên xwe bi rihekî azad mezin kirine û bûn lehingên şoreşê. Ji bo ku em karibin bi azadî jiyan bikin, leşger û lehing pêwîstin. Hêza ku dayika Uweyş daye rêbertî hişt ku li hember dewleta tirk û dewletên deshiladar têkoşîn bike û civaka kurd azad bike."

Derbarê mijarê de dayika Ş.Tolhildan Zagroz, Rojîn Ehmed anî ziman ku Dayîka Uweyş li bajarê Edene yê tirkiyê jiyana xwe ji dest daye û wiha berdewam kir;



Dema berê yên wek dayika Uweyş kêm bûn. Yadê Uweyş Kesayetek pir xurt û bi hêz bû, zarokên xwe tev bi ceger û bi azadî mezin kirin. Herwiha di nava zarokên xwe de wekheviyê dida meşandim.

Rojîn Ehmed diyar kir ku azadiya civakê ji azadiya jinê dest pê dike û wiha bi dawî kir; "Jinan di kesayeta dayika Uweyş de gelek taybetî û rêbazên berxwedanê nas kirin, heman demê hêz û baweriyên xwe jî mezin kirin. Em bihêvî ne tevayiya jinên cîhanê bibin mîna yadê Uweyş. Da ku em kesayetên wek rêber Apo mezin bikin."

# "DAYÎKA MIN YEK JI PAŞMAYIYÊN XWEDAWENDAN E"

**Jiyan BOZO/Qamişlo**

Li warê pêxemperan carekedin dîrokê xwe dûbare kir. Zarokê ku bi salan dê û bav û her kes li bendê bû ji dayîk bû. Ji bo gelekî bindest dîrokeke pîroz bû, zayîn û vejêneke nû bû. Lê ya rest ew bû ku ji zêkê dayîkeke berxwedêr zarokek azadîxaz û welatparêz ji dayîk bû.

Landika ku Zerîfe, Besê û bi hezaran jinên berxwedêr di hûndirê xwe de hejand û mezin kiribû, jineke azad û asî mîna dayîka Ûweyş jî mazin kir. Ji ber wê ti hevok nikarin wesfê jineke wiha bide.

**" MIN METREYEK QUMAŞ JI BO DAYÎKA XWE NEKIRÎ "**

Rojhilata Navîn ku dergûşa mirovayiyê ye, bi Xwedawend re li dinyayê tevî deng veda ye. Jinên vê herêmê, jiyan afirandin û tecrûbeyên xwe yên bi nirx radestî cîhana mirovahiyê kirin. Bê guman yek ji wan dayikên fedekar ku karî bû zarokekî bi nirx ji bo civakê û mirovayiyê mezin bike Dayika Ûweyş e. Dayika Ûveyş yek ji wan dayikên Kurd, ku kariye bi aweyekî herî baş rastiya civaka Kurd di wê serdemêda bide nasîn. Zarokê xwe fêr dike ku ti carî hemberî neheqî, desthilatdarî û zordestiyê serê xwe netewînin û bê helwest nemînin. Ji ber wê ev dibe derseke mezin di jiyana Rêber Apo de.

Rêber APO ji bo Dayika Ûweyş dibêje ku "Dayika min yek ji paşmayî Xwedawenda ye." Ji bo wê Rêber APO êş û janên jinan di kesayeta dayîk, xwîşkên û hevala xwe Elîf de dît û di kesayeta wan de jinên Kurd û Rojhilata Navîn analîz kirin. Bersiva Rêbertî ji keda dayîkan, bi taybetî jî dayîka Ûweyş re bû tekoşîna bêhempa li hember hişmendiya zilamê serdest, cinsiyetparêz û hwd. Bê gûman îro di encama wê têkoşîna 45 salî de jina Kurd gihîştiye astekî bilind di têkoşîna azadiyê de.

Rêber Apo gelek carî balkşandiye ser mafê dayîka Ûweyş û dibêje 'raste min metrek paç jî ji bo dayika xwe nekirî ye, lê ez hewil didim welat û jiyanekî azad ji bo dayikan tevan bikim diyarî.' Bi vî rengî Rêber Apo heskirina xwe li hember dayîka Ûweyş û dayikan tevan tîne ziman. Roja me ya îro tekoşîna



jina azad li Kurdistanê de, di cîhanê giş dengveda ye. Çukên desthilatdara li beramberî vê tekoşînê dilerizin. Ev bi saya dayê Ûweyş a ku wek xwedavendekê, rêberek ji bo parastina mirovahiyê mezinkir. Çanda xwedavendan ku dayîka Ûweyş daye meşandin û têkoşîna civaka azad ku Rêber Apo birêve dibe, li herderê balav bûye û derketiye asta herî jor. Çimkî Wateya herî rast ya çanda xwedavenda, nirxê demokratîk yê komînal, civaka axlaqî û polîtîk e. Ji bo wê divê jin çanda ku dayîka Ûweyş temsîla wê kiriye, berdevam bikin û bingehê jiyana xwe bi hêzeke mezin pêşbêxin. Divê her dayîkek zarokê xwe ji bo paşeroja civakek axlaqî û polîtîk mezin bike. Çimkî em jin berpirsiyarê vê kedê ne, xwedîderketina li vî mîrasî erkê me ye.

# Çarenûsa bi sedan ya jinên Êzîdî ne diyar e



Hevseroka Mala Êzîdiyan ya herêma Cizîrê Leyla Îbrahîm, da zanîn ku çarenûsa hezar û 190 jinên Êzîdî ne diyar e û got, kesên ferman pêk anîn, li ser Şingalê li hev dikin û komployan pêk tînin. Û ji bo rizgarkirina jinên revandî jî ne cidî ne.

Ji dî rokê ve 74 ferman hatin serê Êzîdiyan. Herî dawî 3`yê Tebaxa 2014`an dema çeteyên DAIŞ`ê êrişî Şingalê kirin ku warê bingehî yê Êzîdiyan e, xelkê wê kuştin, dan koçberkirin û revandin.

Li gorî daneyên nivîsgeha rizgarkirina Êzîdiyên revandî, di roja yekê ya êrişan de, hezar û 293 Êzîdî hatin kuştin û 68 cihên olî hatin wêrankirin. Heta niha 80 gorên komî yên wan qurbanan hatine dîtin.

Li gorî daneyên saziyên Êzîdiyan, çeteyên DAIŞ`ê 6 hezar û 417 Êzîdî revandine. Di nava wan de 3 hezar û 548 jin û 2 hezar û 869 mêr in. Di operasyonên rizgarkirinê de 3 hezar û 537 Êzîdî hatine rizgakirin ku di nava wan de hezar û 201 jin, 339 mêr, hezar û 43 keç û 954 kur in.

Herwiha li gorî jina Êzîdî ku piştî 7 salan ji DAIŞ`ê hatiye rizgarkirin ya bi navê Neclaa Seîd Ismaîl, jinên Êzîdî û zarok vediguhêstin herêmên di destê çeteyên DAIŞ`ê de yên li Iraq û Sûriyê. Hinek jî birine Tirkiyê.

Hevseroka Mala Êzîdiyan ya herêma Cizîrê Leyla Îbrahîm diyar kir ku çarenûsa hezar û 190 jinên Êzîdî ne diyar e û axaftina xwe wiha domand: "2014`an DAIŞ`ê êrişî Şingalê, navçe û gundên wê kir. Komkujî, darvekirina komî kirin. Ew di gorên komî de hatin veşartin ku hê gelek ji wan goran nayên zanîn."

Leyla Îbrahîm wiha pê de çû: "Di êrişan de bi hezaran jinên Êzîdî hatin revandin, kuştin û di nava sûkan de hatin firotin. Çeteyan tevahiya cureyên tundiyê û îşkenceyê li dijî wan pêk anîn. Di dirêjahiya dîrokê de, gelek komkujî bi ser me de hatin. Hemû jî li ser destê osmaniyan bûn. Armanc jî qirkirina êzidiyan e."

Leyla Îbrahîm da xuyakirin ku civaka Êzîdî civakeke aştîxwaz e, bi pêkhateyên din re mîna bira dijîn, neheqiyê li kesekî nakin. Digel wê jî her tim bûne hedefa dijminan di sêrî de dagîrkerên Tirkan. Li bakur û rojhilatê Sûriyê ji bo rizgarkirina jinên Êzîdî yên revandî, Komîteya Rizgarkirina Jinên Êzîdî hat avakirin. Li ser wî bingehî, bi dehan jin ji aliyê Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD), YPG, YPJ'ê ve di pêngavên rizgarkirina herêman ji çeteyên DAIŞ`ê de hatin rizgarkirin.

**"HIKUMETA IRAQÊ Û BAŞÛRÊ KURDISTANÊ DERBARÊ RIZGARKIRINA JINÊN REVANDÎ DE NE DURIST IN"**

9`ê Cotemeha 2020`an bê girtina nêrîna şêniyên Şingalê, hikumeta Bexdayê û PDK'ê ragihandin ku têkildarî birêvebirina Şingalê bi alîkariya Neteweyên Yekbûyî (NY) gihatine lihevkirinê.

Derbarê vê yekê de Leyla Îbrahîm wiha got : "Êzîdî hê ew komkujiyên ku li dijî wê ji aliyên dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên DAIŞ`ê ve pêk hatine, ji bîr nekirine. Li şûna ku alîkariya Êzîdiyan bikin, hikumeta Iraqê û başûrê Kurdistanê li ser hesabê Şingaliyan peymanan imze dikin."

Leyla Îbrahîm got, divê nêrîna şêniyên Şingalê di ber çavan re were derbaskirin ne ku werin paşguhkirin.

Leyla Îbrahîm di dawiyê de banga rizgarkirina jinên Êzîdî yên revandî kir û got, "Mixabin xuya ye rewşa jinên Êzîdî yên revandî ji bo hikumeta Iraq û başûrê Kurdistanê ne girîng e. Ji ber wê di hewldana rizgarkirina jinên revandî de ne cidî ne."*ANHA*

# Bunyamîn Şeker: dixwazin bi tecrîd û êrişan civakeke bindest bafirînin

Bi bilinkirina asta tecrîda li ser Rêber Ocelan û dijwarkirna êriş û sûcên li dijî HDPê, Rejima AKP-MHPê dixwaze xebat û destkefiyên siyasî tine bike û desthilatê ji xwe re misoger bike. Hiqûqzan van kiryaran bi ‘Faşîzma huqûqnenas’ bi nav dikin.

**“FIKIRÊ AZAD BI TECRÎDÊ TINE NABE”**

Têkildarî tecrîda li Imralî û êrişên li ser HDPê, parêzer Bunyamin Şeker axivî û ev nirxandin kir; “Li girtîgehê, li dijî birêz Ocelan ev 22 sal tecrîd tê kirin. Dixwazin rola pêşengtiya Rêber Ocelan û bandora wî ya fikirî li ser xebatê gelan tine bikin. Rêber ocelan di girtîgehê de, karîbû bi fikirê xwe yê azad xebata ku li derve tê kirin, xurttir bike. Lewra AKP-MHPê ev yeke xetereke mezin li ser perjewendiyên xwe dibînin û herku diçe tecrîdê hişiktir dikin. Ev tecrîd dijî zagonên navneteweyî û mafê girtiyan e.”

Bunyamin Şeker bal kişand ser çalekiyê zindanê û wiha berdewamî da axiftina xwe; “Armanca AKP-MHPê ji hevpeyvîna telefonê ew bû ku fikar û çalakiyên gel dijî tecrîdê kêm bike. Lê Rêber Apo armancên AKPê ya veşartî bi riya gotina ku `Hem malbat şaş e,ham jî dewlet şaş e` eşkere kir. AKP-MHPê dixwaze Gerava Birçîbûnê ya di zindanan de û çalakiyên li seranserê cîhanê, bê deng bike. Divê em bi vê hevdîtinê neyên xapandin. Divê em Çalakî û xebata xwe ya siyasî û hiqûqî hê xurtir bidomînin.”



**“DOZA GIRTINA HDPÊ SIYASÎ YE”**

Bunyamin diyar kir ku plan û projeyên hikumeta Tirkî li Imarlî bi ser neketin û destnîşan kir ku ew dixwaze walatê Tirkiyê bike zindanekê mezin û wiha domand; “armanc û planên AKP-MHPÊ di Imeralî de, bê bandorbûn. Xebat û bertekên gelan li dijî siyasta wê zêdetir dibe. Dixwazin civakeke bindest û bêdeng ava bikin. Ev yek dibe sedem ku bi êrişên çekdarî û nehiqûqî HDPê bike armanc. Berî niha her du Hevserokên HDPê bi biryareke siyasî, nehiqûqî destgîr kirin û bi hezaran endam û parlametarên wê xistin girtîgehan. Lê tersê planên AKPê, xebata siyasî û civakî gîhaye asteke bilind. Ev xebat karîbû projeyên wê yên qirêj bixe xeterê de. Lewra bi biryareke siyasî doza girtina HDPê derxist holê. Di çi zagona de nine ku xebat û têkoşîna ji bo bidest xistina mafê gel, bi sûc bê binav kirin û nûnerê gel bi terorizmê bê pênase kirin. Di çarçoveyeke nehiqûqî ev kiryar tên kirin. Armanca wê jî, misugerkinina desthilatê, veşartina şikestinên xwe û tinekirina deng û xebata gel ya siyasî ye.”

**“GERGERIOGLU DESTHILATA WAN HEJAND”**

Şeker wiha berdewamî da axiftina xwe; “Parlamentar Omer Gergerioglu jî, bi têkoşîna xwe ya bênavber, bû dengê gelê xwe, dengê girtiyên riya azadiyê û bangxwazê ya mafê mirovan. Bi xebata xwe karîbû desthilata AKP-MHPê bihejîne. Lewra bi biryareke siyasî angu neqiqûqî, mafê parlemanteri ya wî hat wergirtin. Di rewşeke ku tenduristî ya wç xerab de jî hat destgîrkirin û eşkencekirin.”

Hiqûqnas Bunyamin Şeker bi vê peyamê axafina xwe qedan; “Hemû kiryar û êrişên AKP-MHPê bi armancekî faşizmane tên kirin. Siyaseta wê, nedemokrasî û nemirovî ye. Divê gel bi rêxistin xebata xwe li dijî faşizmê û sûcên wê yên bênavber dewam bike.”

## Vê carê Derya Reş germ dibe



**Ahmet AKTAŞ**

Heta niha, bi giranî nakokî û pevçûn li ser Derya Spî bûn. Bi daxwaz û hilwest û hewldanên dewletên YE’yê, dewleta AKP-MHP’ê gav bi paş ve avet û nuha li vê deryayê û herêmê nakokî hinek hatin e rawestandin.

Bi qeyran û aloziya li Ukranyayê re, qada nakokiyan veduguhez e Derya Reş. Weke gotina ku dibêjin ,”tu kîjan kevirî radikî” ji binê wî kevirî Tirkiye derdikeve! Li vira jî em bala xwe didinê, ji roja despêkê ve, desthilatiya R.Erdogan di serê vê govenda Ukranyayê de, tê xuyakirin û dileyze.

Hema ji nişka ve hat dîtîn ku serokê Ukrayna Zelenskiy û R.Erdogan li Stenbolê rûniştine û peymana li pey hev imze dikin. Li ber kamera, rengê dostayî û hevalbendiya xwe, di asta stratejik de nîşan didin û gelek bi gotinên qelew radigihînin.

Bêgûman li ser van têkiliyên bi vî rengî yên R.Erdogan, Putin ji mêj vê agahdar e û car caran ne razîbûna xwê jî nîşan dida. Li ser vê hevdîtinê jî, tê gotin bi telefonê li gel R.Erdogan axivîye!

Li goreyî xwe R.Erdogan, her du dewletên sereke yên cîhanê dixapîne û ji nakokiyên navbêna wan sûd werdigre. Erê nikare kesî bi xapîne, lê herî kêm raya giştiya xwe ya hundurê Tirkiyeyê bi vê propagandayê dikare bi xapine.

Weke tê zanîn, bi vê mijarê ve girêdayî projeya Kanal Stenbolê jî di rojevê de ye. Li goreyî nûçeyan, çend rojên din 2 geştiyên DYE’yê, di dervazên Derya Marmara re, ew ê dersbasî Deryaya Reş bibin.

Dibe ku êdî Putin, nema sebir kir û aşkere Tirkiye vexwend ser Peymana Montroyê û got “divê hûn li goreyî şerd û mercên vê peymanê tevbigerin”!

Ev bûyera Ukrayna-Donbassê, ji bo desthilatiya AKP-MHP’ê, bû weke ku ji wan re, şensa Mili Piyango lê bide, hema bi dest û lepa ketin nava vê planê. Jiber ku van “Bazirganên Kujerên Kirêgiran”, peyayên wan ên kujer, di destê wan de bê kar mabûn, li ser stuyê wan bûbûn bar, diviya li deverekê bidin xebitandin, eha aloziya Ukrayna derket û hate ber deriyê wan!

Lê wisa diyar e ew ê nikaribin weke ku ew dixwazin bixin bazarê. Jiber ku him Rûsya jî di vê derbarê de gelek heşyar û xwedî serpêhatiye û him peyayên wan ên kirêger(bi erebî=mirtezeqe), ne gelek amade tên xuya kirin. Mînak, ên ku şandibûn Libyayê û Qerebaxê, ev çend roj in di çalakiya protestoyê de ne. Doza ‘pereyên kirêya’ xwe dikin û dibêjîn “fermandarê me Ebu Emşe(Serokê Tugaya Siltan Silêman Şah), hîn meaşên me yên Libya û Qerebaxê neda ye û em xapandiye” û hwd?

R.Erdogan, li goreyî xwe, li Rojava û Sûriyeyê, ji nakokiyên navbêna Rûsya û DYE’yê, xwe serkeftî dide diyar kirin. Lê di jiyanê de ev propaganda wî piştrast nabe. Jiber ku çi devera ku gav avêtibê, li wir jiyan lewitandiye, alozî û qeyran gihandiye asta herî bilind; kurt kurmancî, ji xwe jiyan ji gelê wê deverê re nehiştiye, lê ew dever hemû li serê wî jî bûye bela! Bi tenê li hundur, bi propagandeyên misilmantî û tirkperestiyê, karibû temenê desthilatiya AKP-MHP’ê dirêj bike.

Lê gûman xurt heye ku vê carê, germa Derya Reş, ew ê rûyê wan reştir bike, dibe ku wan bi şewitîne jî û weke mînaka Yemenê û Mûşê, ew ê li ser van jî stranên; “çûyîn hebû, lê çima veger tune bû(?)” were gotin.

## Gelo çima di navbera Misir û Tirkiyê de danûstandin rawestiya?



Çavdêran diyar kir ku dewleta tirkî diyaloga bi Qahîre re ji bo propogandaya siyasî bi kar anî û gotin, ji ber ku dewleta tirkî di gelek mijaran de ne durist e, weke vekişandina çeteyan ji Libya, Misirê diyalog rawestand.

Berî niha nûçeyên derbarê rawestandina diyaloga di navbera Qahîre û Enqere de ketin rojevê. Dewleta tirkî şertên Misirê yên weke vekişandina çeteyan ji Lîbya, radestkirina rayedarên Ixwan El-Muslimîn ku ji aliyê dozgeriya Misirê ve tên xwestin û rawestandina destwerdana dewleta tirkî li karê Libya, Sûriye û Iraqê, bûn sedem ku Misir danûstandinan rawestîne.

Tevî nûçeyên derbarê paşxistina diyalogan de, dewleta tirkî hewl dide Misrê razî bike û li hev werin. Têkildarî mijarê Wezareta Karê Derve ya Tirkiye diyar kir ku wezîrên karê derve yên Tirkiye û Misrê roja Yekşemê bitelefonê axivîne.

Dewleta tirkî meha derbasbûyî diyar kiribû ku bi Misirê re dest bi têkiliyên dîplomatîk kiriye û dixwaze hevkariyê baş bike. Lê Misrê bersiv da û ragihand ku divê gotin pêk were.

Enqere ji kanalên Ixwanan yên li Tirkiyê dixebitin, xwest rexneyên li dijî Qahîre sivik bikin. Herwiha dewleta tirkî ji bo çareserkirina pirsgirêka kêştiya li kanala Suweyşê, destek pêşniyar kir. Tevî van hewldanên dewleta tirkî, lêkolîner û çavdêrên misrî dibêjin, dewleta tirkî di mijara lihevhatinê de ne durist e û sirf propagandayê dike. Têkildarî mijarê, lêkolînerê misrî yê pisporê kar û barê tevgerên islamî, rêxistinên dijwar Mûnîr Edîb wiha got: “Misir jî di navê de, dewleta tirkî naxwaze pirsgirêkên siyasî yên di navbera xwe û dewletên cîran de yan jî dewletên aktîf û sereke yên li herêma erebî re çareser bike. Lewre têkiliya Enqere di serî de Ixwanî bi komên dijwar yên siyasî û rêxistinên dijwaw yên li herêmê, heye.

**“DI NAVBERA DEWLETA TIRKÎ Û KOMÊN RADÎKAL DE TÊKILIYEKE ÎDEOLOJÎK HEYE”**

Mûnîr Edîb diyar kir ku di navbera wan de têkiliyeke fikrî û îdeolojîk heye. Herwiha di navbera van rêxistinan de û xwesteka Enqere de heman armanc hene. Dibe ku ev girêdan sedema nakokiyên hişk yên di navbera Qahîre û Enqereyê de be.



Edîb pêşbînî dike ku rewş weke xwe bimîne û diyar kir ku dewleta tirkî naxwaze rayedarên Ixwanan radest bike. Nexasim yên beşdarî bûyerên dijwariyê bûyîn. Ku Yehya Mûsa û Ella El-Semahî ji wan in.

Edîb da zanîn ku dewleta tirkî piştgiriya Ixwanan dike û nasnameyan dide rayedarên wan yên ji Misrê reviyayîn û beşdarî bûyerên dijwariyê bûyîn û wiha domand: “Enqere ji berê ve piştevana sereke ya van rêxistinan e.”

Mûnîr Edîb da xuyakirin ku Misrê vê helwesta Enqere heqaret dibîne û berdewamiya aloziya berê û wiha domand: “Misir gihîştiye wê baweriyê ku Enqere bi derengî tev digere û li ser heman rêbaza xwe ya berê dimeşe. Li aliyekî din jî xwestekên Qahîre red dike. Dewleta tirkî ne xwediya îradeyeke rast e ku li pêşberî komên dijwar bisekine yan jî piştgiriya wan neke.”

Edîb eşkere kir ku dewleta tirkî piştgiriya rêxistinên tundrew yên li Misir, Sûriye, Libya û Iraqê dike. Herwiha dema DAIŞ`ê 29`ê Hezîrana 2014`an dewleta xwe ragihand, dewleta tirkî alîkariya wê kir û dema DAIŞ`ê Adara 2019`an hat hilweşandin, li Afrîka li welatekî alternetîf digere. Mûnîr Edîb got, ev sedem û hin sedemên din, dibe ku bihêlin têkiliyên di navbera Misir û Tirkiyê de weke xwe bimînin û dijminiya dewleta tirkî ya li hemberî Qahîre dewam bike.

Lêkolînerê misirî da zanîn ku başkirina rewşa heyî ne bi gotinan e, bi kiryaran e û Enqere negihîştiye asta helwesta rastî ku mirov bêje wê têkilî vegerin weke berê.*ANHA*



# Dixwazin fermaneke din bînin Serê Êzîdiyan

Sala 2014an li hemberî êrişa DAIŞê ya ser Şingalê, hêzên PDKê ji Şingalê reviyan û Şingalî bêparastin hiştin. Piştî ku fermana 74an bi serê gelê Şingalê de hat, gelê Şingalê parastina xwe ya cewherî ava kir. Lê dewlata tirkî bi hevkariya PDKê û hikûmeta Iraqê dixwaze fermaneke din bi serê Êzîdîyan de bîne.

**Darîn Silê/Qamişlo**

**“TIRKIYE ÊZÎDIYAN WEKE STÛNEKE KURDAN DIBÎNE”**

Derbarê mijarê de hevserokê Tevgera Civaka Demokratîk Xerîb Hiso wiha axivî: “Di çanda Êzîdiyan de dîrokek veşartî heye. Tirkiyê, Êzîdiyan wek stûnekî kurdan dibîne, ji bo wê dixweze Kurdê Êzidî jî qir bike. Lê Êzîdiyan bi vîneke mezin û bi rihê berxwedanê planên tirkiyê şkandin. Ne tirkî tenê, dewletên navnetewî jî destê wan di pêkanîna komkujiyê de heye. lê bi xwedîderketina gelê kurd, vîna Şingaliyan xurttir bûye û bi pêş ketiye. Salên dawî gelek êriş bi ser Şingalê de hatin kirin, wê demê jî hikûmeta Îraq û ya başûrê Kurdistanê bêdeng man.”



**“HÊZÊN NAVNETEWEYÎ LI HEMBERÎ KOMKUJIYÊ BÊ DENG IN”**

Xerîb Hiso li ser komkujiya Şingal ya 2014an jî wiha got: “Di komkujiya 2014an de zêdetirî 5000 jin hatin revandin, gelek ji wan hatin qetilkirin û destdirêjî li wan hat kirin. Heta niha jî ti hesab xwestina van jinan nehatiye kirin. Wê demê hikûmeta Îraq û hêzên herêma kurdistanê jî xwe vekişandin û parastina Şingalê nekirin. Em jî dibêjin yê ku parastinê neke û rê li pêşiya dijmin veke, nikare li dijî rizgarkirina Şengalê tiştekî bike. Hikûmeta başûrê kurdistanê li hember komkujiyê parastina Şingalê nekir, ev jî tê wateya ku ew jî şirîkê vê komkujiyê ye. Heta niha dewletên navnetewî jî ji bo vê komkujiyê bê dengin. Lê şervanên YPG û YPJ`ê bi têkoşîn û qehrmaniya xwe gelek jinên Êzîdî rizgar kirin.”

Xerîb Hiso axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Çawa ku tirkiyê dixwaze rojhilata navîn bê kurd be, Partiya Demokratîka Kurdistan (PDK) jî dixwaze başûrê Kurdistanê bê civaka Êzîdî be. Ev jî xeterek mezin li pêşiya yekîtiya kurdan çêdike. Em bi hêvî ne ku ji naha û wêda Partiya Demokratîka Kurdistan bibe cihê çareserî û baweriyê.”

## Armanca derewên artêşa tirkî



**Zekî BEDRAN**

Dewleta tirkî her çiqas di hundir de pirsgirêkên wê yên giran hebin jî, li Sûriyê dixebite dagîrkeriya xwe mayînde bike û dijmintiya Kurdan didomîne. Hikumeta AKP û MHPê rengekî faşîzmê dimeşîne. Ti rewabûna dagîrikina Sûriyê nîne. Lê bi demagojî û komployan dixebite egeran jê re peyda bike. Faşîstên Tirkan digel nakokiyên nava xwe di xurtkirina nijadperestî û miliyetgiriyê de di nava pêşbirkê de ne.

Dewleta tirkî li Sûriyê dixebite herêmên dagîr kirîn bi ser welatê xwe ve bike. Li herêmên weke Efrînê qirkirina neteweyî dike. Zimanê kurdî qedexe dike. Fakûlteyên xwe vedike. Qaymeqam, amir û memûrên rêveberiyê dişîne wir. Herêmên weke Til Rifet û Şehba di binê êrişan de ne. Êrişên ser Eyn Îsa û Til Temir jî dewam dikin. Dixwaze herêmên dagîr kirîn fireh bike. Dixebite derfetên domandin jiyana gel ji holê reke. Li gundewaran ku mirov nikaribin zeviyên xwe biçînin û heywanên xwe biçêrînin, derfetên jiyanê namînin. Wê demê ji koçberiyê pêve ti rê li pêşiya wan namînin. Weke din ji ber topbaranê ewleyiya canê wan jî namîne. Çawa ku heta niha gelek sîvîl hatine kuştin.

Gelê Sûriyê ji vî şerî pir kişand. Hem li hundir hem li derve gelek hêz û derdor dixwazin şer biqede û bi riyên siyasî pirsgirêk çareser bibe. Lê Tirkiye li dû êrişên nû û planên dagîrkirinê ye. Li şûna ku dawiyê li dagîrkeriyê bîne û vekişe, weke hêzeke mayînde tev digere. Dewletên dinyayê tev û derdorên demokratîk dixwazin dagîrkerî biqede û hêzên biyanê ji Sûriyê derkevin. Lê Tirkiye di tersê wê de israr dike. Bê ku şerm bike her tim dibêje em alîgirên yekbûna erdê Sûriyê ne. Li milekî amadekariya dagîrkerî û li milekî gotina alîgiriya yekbûna erdê Sûriyê karê Tirkan e. Di wî warî de mahir in.

Jimara Kurdên li Sûriyê ne pir e. Rojava parçeyê Kurdistanê yê herî piçûk e. Kurd bi piranî li nêzî sînorê Tirkiyê ne. Lewre sînorên heyîn ne sînorên xwezayî ne. Ji aliyê Fransa û Tirkan ve hatina xîzkirin û di navbera eşîr û gundên Kurdan de li ser nexşeyê xet hatine kişandin. Kurdan ti caran ev sînor qebûl nekirine. Ew dibêjin “serxet û binxet”. Di serê wan de cî nebû ku du welat in. Li binxetê ango Kurdên di nava sînorên Sûriyê de ji ber êrişên DAIŞê û nekarîna rejima Beesê ya parastina herêmê Kurdan xwe bi rêxistin kir û xebitîn herêmên xwe biparêzin. Bi berxwedan, biryar û şerê xwe bi koalisyona navneteweyî re xebitîn. DAIŞ bin xistin. Lê Tirkiyê qebûl nekir ku Kurd hebin û bibin xwedîstatû. Li hemberî vê dest bi dagîrkirinê kir. Xebitîn ku yên DAIŞ tine kirîn ji herêmê derîne û tine bike. Dixebite ku sînorekî bê Kurd û Sûriyeyeke bê Kurd biafirîne.

Dewleta tirkî hi gelên dinyayê re her tim derew kirin. Rastî berûvajî kirin. Her tim dibêje PKK û YPG yek in. “PKK terorîst e.” PKK û DAIŞ yek in. Em ferqê nexin navbera wan. YPG ji bo me tehdîd e. Di sînorê me re dikevin welatê me. Her tim van derewan dubare dike û dibêje; çar pênc endamên PKK û YPGê hatin kuştin. Ti kes napirse, nabêje yên hatîn kuştin kî ne, navên wan çi ne, cenazeyên wan li kû ne. Ev nûçeyên derew ji aliyê artêşa tirkî ve tên belavkirin. Yekser ji aliyê wezareta parastinê ve tê belavkirin. Ev polîtîkaya wan diyar dike. Dewleta tirkî her tim derew ji dinyayê re kirin. Got, YPG ji bo me tehdîd e. Lê dinya dibîne. Hêzeke YPGê ya ku artêşeke NATO û Tirkiyê tehdîd bike nîne. Weke din ya tehdîd dike û dagîr dike dewleta tirkî ye. Dewleta tirkî jî ji bo veşartin û berûvajîkirina van rastiyan dibêje; PKK/YPG êrişî sînorên me dikin. Van nûçeyên derew belav dikin. Berpirsên YPGê dembidem van nûçeyan derew derdixin. Lê divê gel û kesên bi siyasetê re mijûl dibin bizanin ku ev nûçe bi zanebûn û bi niyeteke xerab tên belavkirin. Dewleta tirkî bi van nûçeyan dixebite êriş û dagîrkeriya xwe rewa bike. Li herêmên weke Eyn Îsa baregehên xwe zêde dike û çeperên xwe qayîm dike. Ev der ne herêmên nêzîkî sînorên Tirkiyê ne. Li aliyê din Eyn Îsa her roj dibinê êrişan de ye. Ev delîla wê ye ku dewleta tirkî dixwaze şer belav bike û planên dagîrkeriya nû dike. Riya afirandina aramî û aştiyê û parastina yekbûna Sûriyê di qewitandina dagîrkeriya tirkî de ye.

# “Divê em ji bo azadiya Rêbertiyê têkoşînê xurt bikin”



Dayîkên şehîdan dan zanîn ku rêber Ocalan ji bo rizgarkirina gelên bindest û jinan kedeke mezin daye û gotin, divê em ji bo azadiya fîzîkî ya rêber Ocalan asta têkoşîna xwe bilind bikin.

Dewleta tirkî ya dagîrker hê jî li dijî rêber Abdullah Ocalan siyaseta tecrîda girankirî dide meşandin û nahêle malbat û parêzer pê re hevdîtinê bikin. Di vê mijarê de bi gelek dayîkên şehîdan yên bajarê Helebê re hevdîtn hatin kirin. Dayîkên şehîdan diyar kirin ku ji bo azadiya rêber Abdullah Ocalan divê di her alî de têkoşîna bê xurtkirin.

Dayîka şehîd Viyan, Sedîqe Mihemed ji Helebê ji rêber Abdullah Ocalan û girtiyên Kurd re yên di girtîgehên dewleta tirkî ya dagîrker de silav şandin.

**“JI BO AZADIYÊ BERDÊL TÊ DAYÎN, LÊ EM NE POŞMAN IN”**


Sedîqe Mihemed li axaftina xwe ev zêde kir: “Em her tim gotina “Şehîd namirin” dibêjin, ev jî tê wateyê ku em soza şopandina riya şehîdan û xeta rêber Abdullah Ocalan dişopînin. Rêber Ocalan jiyana xwe kiriye xizmeta doza gelê xwe û gelên bindest.”

Têkildarî berdêlên ji bo parastina nasnameya kurdî hatîn dayîn, Sedîqe Mihemed wiha got: “Me bi hezaran şehîd dan û em ne poşman in. Ji ber ku qelenê azadiyê biha ye, îro rêberê me girtî ye û ev dihêle ku em bi hêrs bibin.”

Sedîqe Mihemed di dawiyê de diyar kir ku wê têkoşîna ji bo azadiya rêber Ocalan bidomînin heta ku civaka navneteweyî ji bêdengiya xwe derkeve û daxwaziyên wan pêk bîne.

**“BI SAYA RÊBER ABDULLAH OCALAN ME NASNAMEYA XWE NAS KIR”**





Dayîka şehîd Mezlûm, Emîne Ebdo jî diyar kir ku rêber Ocalan bi pêkanîna şoreşa azadiyê li çar aliyên Kurdistanê, hişt ku rejimên dîktator hesabê Kurdan bikin. Ew jî piştî ku gelê Kurd li ber keviya têkçûnê bû, pêk hat.

Emîne Ebdo bal kişand ser cewherê fikirê ku rêber Abdullah Ocalan ji jinên Kurd re pêşkêş kiriye, û wiha got: “Bi armanca parastina nasnameya xwe, me xwest beşdarî çalakiyên ku partiyên beriya Tevgera Azadiyê ya Kurdistanê were damezirandin, orgenîze dikirin, bibin, lê wan partiyan girîngî nedid jinên Kurd û tevlêbûna me red dikirin.”

Emîne Ebdo diyar kir ku rêber Ocalan heqîqet û vîna jinan bi wan da naskirin û ji wan re rê nîşan da ku tevlî her qadê bibin û ev yek lê zêde kir: “Ji me re got, azadiya Kurdistanê di rizgarkirina jinên Kurd de ye.”

**“MAFÊ HER KESÎ YE KU TEVLÎ ŞOREŞÊ BIBE”**

Dayîka Şehîd Ozgûr, Fayze



Xelîl jî diyar kir ku armanca dijmin ew e ku gelê Kurd qir bike, Kurdistanê parçe bike û şoreşên wê biçewisîne, lê bi derketina rêber Abdullah Ocalan re Kurdan karî hêviyên xwe zindî bikin û parastina nasnameya xwe bikin.

Fayze Xelîl derbarê perspektîfên rêber Abdullah Ocalan de wiha got: “Gelek caran em bi rêber Abdullah Ocalan re rûniştin. Rêbertiyê ji me re digot, tevî gelek plan û komplo li dijî me hene, divê em bi dozê re hevgirtî bin. Herwiha rêber Apo ji me re destnîşan dikir ku bê cudabûn mafê her kesî ye ku tevlî şoreşê bibe û cihê xwe tê de bigire.”

*ANHA*